Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1297 10-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Dêra Mar Yaqûb EL-Nisêbînî...Dengê Zingil û stranên giyanî ku ji dîrokê de di dil de maye

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

**Di demekê de ku nîşaneyên dîrokî diguherin, Dêra Mar Yaqûb EL-Nisêbînî kevintirîn Dêra bajarê Qamişlo, xwegir maye. Keşeyê dêrê Bav Aho Ibrahîm diyar kir ku ew ne tenê mîna dêrekê lê dinêrin, lê belê ew mîna duayeke ku li ser axê hatiye kirin û ber bi ezmanan ve hatiye bilindkirin.**





Rojavayê Kurdistinê gelek ol û netew di nava xwe de dihewîne û mîna yek netew bi hev re dijîn. Li bajarê Qamişlo di nava bazara wê de Dêra Mar Yaqûbê Nisêbînî mîna şahidekî şahidiya dîrokên kevnar dike. Di demên ku giyan ji neynikan zelaltir û dua ji sozan rasttir bûn, ev dêr hatiye avakirin.

Dêra Mar Yaqûb El-Nisêbînî wekî dêra herî kevin ya bajêrê Qamişlo ye, şahidê zindî yê dîrokeke ku bi bawerî û serhildanê tijî ye. Dêr ne tenê avahiyek dîrokî ye ku dîroka wê vedigere sala 1927`an ew neynikeke bîranînên bi êş û hêviyên dayikan, hêsirên penaberan û kenê zarokan hembêz kiriye.

Di destpêka sedsala bîstan de, bi hatina Suryanan ji bo bajarê Qamişlo ku ji ber zilm û qirkirinê, pêwîstiya bi cihekî îbadetê lezgîn bû. Dêra Mar Yaqûb El-Nisêbînî yekem dêra Xiristiyan bû ku di sala 1927`an de li bajêr di nav xizaniyeke mezin de lê bi baweriyeke xurt, bi kelpîçên heriyê hat avakirin.

**'Dêr ji bo me bûye cihekî dîrokî'**

Keşeyê niha yê Dêra Mar Yaqûbê El-Nisêbînî, Bav Aho Îbrahîm, ji me re axivî û diyar ku ew ne tenê mîna cihekî ku lê nimêj û duayan dikin, lê belê ew mîna cihekî dîrokî lê dinêrin.

Aho Îbrahîm wiha axaftina xwe berdewam kir: "Ev dêr ne mîna hemû avahiyên ku ji bo nimêjê ye, ew duayeke ku li ser axê hatiye kirin û ber bi ezmanan ve hatiye bilind bûye. Lewra bi destên westiyayî yê tijî hêvî hatiye avakirin. Çimkî kelpîçên wê yên pêşîn tevliheviyek ji ax û hêsran bûn."

Piştî bihurtina salan ji avakirina dêrê ya ji heriyê bi demê re hilweşiya. Bi pêşengiya Mar Estasyûs Qryaqis Tanwarji, avahiya kevin di sala 1947an de hate hilweşandin û li şûna wê 16 dikanên hatin avakirin. Piştre dêra nûjen ji aliyê avahîker Erdaşîs û Afram Brsom di sala 1953an de, hate avakirin û roja Pêncşema 14`ê Gulana 1953an de bi pîrozbahiyeke bi heybet hate pîroz kirin.

Tevî şer û guhertinên ku li Sûriyeyê qewimîn jî, Dêra Mar Yaqûb El-Nisêbînî wekî çirayek baweriyê ma. Di demekê de ku gelek pencere li seranserê welêt hatin girtin, pencereya dêrê ji bo ronahiyê vekirî ma û zengilên wê qet dev ji lêdana wê berneda. Herwiha mûmên wê qet nevemirî û li dijî tirs û wêraniyê, sirûdên wê berdewam kirin.

Aho Îbrahîm wiha li gotina xwe zêde dike: "Dêra ne tenê ji bo îbadetkaran bû, lê ji bo hemû kesên ku ji jiyanê westiyabûn, stargeheke bû. Li vir, Suryanî, Asûrî, Ermenî, Keldanî û heta birayên me yên Misilman ji bo aştiyê di duayan de kom bûn. Em bawer dikin ku Xwedê ji hemû sînorên mezheban mezintir e."

**Ne tenê ji bo dueyan ne ew bûye navendeke çandî**

Îro, dêr êdî tenê bi duayan ve sînordar maye, ew bûye navendeke girîng ji bo çalakiyên çandî û civakî. Hefteyên dua ji bo yekîtiya Xiristiyanan li wir têne lidarxistin. Her wiha li Dêrê ji aliyê Komelaya Isrt Mar Afram Suryanî û Foc Keşafê perwerdehiya olî xizmetê dike.

**'Her mûmeke wê xwedî çîroke'**

Herwiha ji bo giyaniya cihê pîroz ya Mar Yaqûb El-Nisêbînî û gelek giyanên din yê sal 1936`an de li rojavayê dêrê hatine veşartin, her sal bi rêzdarî tên bi bîr anîn.

Keşeyê Dêra Mar Yaqûbê El-Nisêbînî, Aho Îbrahîm wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Her quncikek vê dêrê, xwedî çîrokeke taybete. Her mûmeke wê çîroka hizrê dayîka kezeb şewitiye. Her dîwareke wê çîroka her ciwanekî penabere. Ev dêr bûya cihê aramiyê avakirina wê bi xwe bûye mîna mêjekê."

# 50 sal in karê terzîtiyê dike

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Li terzîxaneyên bajarê Qamişlo çend kesên ku temenê xwe di karê dirûtina cilan de derbas kirine hene. Yek ji wan Kesan Gîragors Xesedoris ê Ermenî ye ku ev zêdeyî 50 salî ye bê navber karê terzîtiyê dike.**



Gîragors Xesedoris yek ji kevintirîn dirûnkarê li bajarê Qamişlo ye, zêdeyî 50 salî ye ku bênavber karê dirûtinê dewam dike. Di navbera Xesedoris û mekîneya wî ya dirûtinê de girêdaneke heye ku.. mirov nikare şîrove bike.

**Kutejiyana terzîkarê Ermenî Gîragors Xesedoris**

Gîragors Xesedors ê Ermenî di sala 1960"an de li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye, ew di temenê 14 salî de fêrî dirûtina cilan bûye, ji wê demê heta niha ew ranewistiyaye û karê xwe bi hezkirinke mezin dike. Gîragors Xesedors wiha behsa jiyana xwe dike: "Ji ber zehmetî û zextên malbatê min nikaribû bixwînim. Ji bo wê jî min tenê qonaxa seretayî bi dawî kir. Ji zarokatiya min ve karê terzîtiyê bala min dikşand. Ez ji 14 saliya xwe û heta niha yanî ev 50 salin karê dirûtinê berdewam dikim."

**Heta niha ew li ser makîneya xwe ya kevin cilan didirû**

Gîragors Xesedors Bi awayekî pîşeyî karê xwe dike, rojane di dikana xwe ya piçûkê de li bajarê Qamişlo kar dike û dengê makîneya wî ku zêdetirî 50 salî ye li ser dixebite, nayê rawestandin. Di demên destpêka karê wî de cil û bergên zilaman tenê didrûtin, lê bi demê re yên jinan jî dirûtin.

Gîragors balê li ser astengiyên ku di karê wî de derdikeve dibêje: "Dema berê û niha gelek ferq têd e heye ji hêla kar ve ku karê min kêm bûye ji ber temenê min, herwiha di dema niha de jî ji ber rewşa germahiyê ya bilind ez hinekî zehmetiya dikşînim ji ber rewşa tenduristî."

Sudoku: Bersiv 51

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 1 | 3 | 4 | 5 | 2 | 9 | 7 | 6 |
| 2 | 5 | 7 | 1 | 6 | 9 | 8 | 3 | 4 |
| 4 | 6 | 9 | 3 | 8 | 7 | 2 | 5 | 1 |
| 6 | 7 | 4 | 5 | 9 | 3 | 1 | 2 | 8 |
| 3 | 9 | 1 | 6 | 2 | 8 | 7 | 4 | 5 |
| 5 | 2 | 8 | 7 | 4 | 1 | 3 | 6 | 9 |
| 1 | 3 | 6 | 9 | 7 | 5 | 4 | 8 | 2 |
| 9 | 8 | 5 | 2 | 3 | 4 | 6 | 1 | 7 |
| 7 | 4 | 2 | 8 | 1 | 6 | 5 | 9 | 3 |

Sudoku:Pirs 52

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 7 | 6 | | | 5 | | 2 | |
| 2 | | | | | 6 | | | 4 |
| | 4 | | | | | 7 | 6 | |
| | | | 4 | | 2 | | 5 | |
| 7 | 8 | | | | | | 9 | 2 |
| | 9 | | 1 | | 7 | | | |
| | 5 | 7 | | | | | 1 | |
| 6 | | | 9 | | | | | 3 |
| | 2 | | 5 | | | 6 | 4 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji bin ve ye:**
- Her tiştê xwe eşkere nabêje; xefên wî pir in.

**Ji dûr ve şûf e, ji nêz ve şelûf e:**
- Berbiçav baş xuya dike, lê mirovekî qeşmer e.

**Kerran biguh neke:**
Kesên haya wan ji mijarê tineyî, ji wan re nebêje; mijarê belav neke.

**Kevirekî hilke, pirsa xwe binke:**
- Gotina xwe ji her kesî re nebêje; gotina xwe veşêre.

**Kew bi zimanê kew zane:**
- Ew ji hev fêm dikin.
(Dema yek tiştekî dibêje, lê her kes jê fêm nake, yek tenê jê fêm dike hingê tê gotin)

**Kêr devê wî venake:**
- Tiştan zûbizû eşkere nake; gotin xwe pê re digirin.

**Kodika xwe vala nekir:**
- Her tişt negot; tiştên ku dizaniyan tev negotin.

**Li ber guhê wî bixe:**
- Bi dizî jê re bêje.

**Me rêkiriye nîskan:**
- Dema yek nexwaze mijarê eşkere bike wê demê bi henekî dibêje.

**Me xwe jê dizî:**
- Me nehişt me bibîne.

**Nayê dest:**
- Tiştên kirîn eşkere nake; dizane veşêre.

**Ne te got ne min bihîst:**
- Bila ti kes bi vê mijarê nehese; bila di navbera min û te de bimîne.

**Ser re çû:**
- Rast negot.

**Serê keçel baş e di bin kumê kulav de:**
- Tiştên bikêmayî, ne li ber çavan bin baştir e.

**Serê şkestî di bin kumê xwe de:**
- Bi heman wateyê.

**Tê sotin nayê gotin:**
- Sirr e; ez nikarim bêjim; nayê gotin.

**Tiştek di binê zimanê wî de heye:**
- Tiştna dizane lê vedişêre; tiştna dizane lê newêre bêje.

**Tiştek di bin serê wî de heye:**
- Tiştna dizane; haya wî ji hinek tiştan heye.
(Ji bo kesên guman ji wan tên kirin ku hinek tiştên xef dizanin tê gotin)

**Tiştek di bin kumê wî de heye:**
- Bi heman wateyê.

**Tiştek di binçengê wî de heye:**
- Bi heman wateyê.

**Tu ji pêlava xwe re dibêjî:**
- Ji devê min dernakeve; ez ji ti kesî re nabêjim.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bi armancgirtina jin û ciwanan dixwazin civakê pûç bikin



Bikaranîna jin û ciwanan ji madeyên hişbir re bûye terzê sermayeyê û bêyî ku ciwan bikevin ferqa vê siyasetê, jêre dibin amûr; valaderxistina şerê taybet û derûnî, encax bi rêya perwerde, têgihiştin û xweparastinê pêk were.**R-3**

## 'Divê jina Sûrî xwebirêxistin bike û bibe hêza veguhertina pêşeroja Sûriyê'



Hevseroka Meclisa Gelan-Efrîn Mûşîre Mele Reşîd da zanîn ku ger îro jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo jinên Sûriyê têkoşîn dikin, divê jina Sûrî li rastiya xwe vegere û xwebirêxistin bike, da ku di pêşeroja Sûriyê de bibe hêza veguhertinê. **R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1297 10-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Eniya demokratîk li hemberî eniya desthilatdar hêza avaker e



Eniya Demokratîk vebijêrka gelan e, di rewşa heyî ya niha de ew ê temsîla îradeya hemû gelan ku ne tenê gelên Sûriyê bike û ji bo hemû veguherînên demokratîk ên li herêmê jî, dê bibe modelekê, hem jî pêkanîna wê siberoja Sûriyê ji berjewendiyên navdewletî û desthilatdarî biparêz e.**R-4**

# 'KONFERANSA PÊKHATEYAN NAMEYA AŞTÎ Û HEVGIRTINÊ YE'

Konferansa Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 8'ê Tebaxê de bi druşmeya "Bi Hev Re Ji Bo Pirrengiryeke Ku Yekîtiya Me Xurt Dike" li bajarê Hesekê li dar ket. Nûnerên pêkhateya Ereb, Suryan û Êzdî ku beşdarî konferansê bûne diyar kirin ku Konferansa Pêkhateyan nameya aştî û hevgirtinê ji bo tevahî gelên Sûriyê ye.**R-5**



## Şoreşa Kurdistanê li benda wêjevanên xwe ye!



"Me xwest ku em vê xebatê ji torevanan re bihêlin, lê wisa xuya dike ku em neçar in wêjeya vê xebatê herî baş bi xwe pêk bînin" (Rêber APO). Ya rast jî ew e! Ji ber ku yên hemû zor, zehmetî û dijwariya kêliyên şoreşê jiyane, milîtan, xebatkar û kadroyên şoreşê bi xwe ne û ji wan baştir jî kesek nikare êşên wan bi lêv bike.**R-7**

## 'Hikumeta veguhêz nikare baweriya gelên Sûriyê qezenc bike'



Endama Yekîtiya Ragihandina Azad Ahîn Dêrik diyar kir ku piştî van komkujiyên ku li dijî gelan di hundirê Sûriyê de têne kirin û hikumeta veguhêz a Şamê cihê xwe di nav de digre, nema baweriya gelan bi vê hikumetê tê.**R-6**



15'ê Tebaxa 2025'an
Ahmet Aktaş R-4



Bi Metodên Aboriya Sexte Şiyanên Sûriyê Tên Firotin
Idrîs Henan R-5



Jiyana weke helbestê
Remezan Olçen R-7

# ‘Divê jina Sûrî xwebirêxistin bike û bibe hêza veguhertina pêşeroja Sûriyê’

Hevseroka Meclisa Gelan-Efrîn Mûşîre Mele Reşîd da zanîn ku ger îro jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo jinên Sûriyê têkoşîn dikin, divê jina Sûrî li rastiya xwe vegere û xwebirêxistin bike, da ku di pêşeroja Sûriyê de bibe hêza veguhertinê.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Li hember komkujî, siyaset û kiryarên ku li ser Siwêda û bi taybet li ser jin ji aliyê hikumeta veguhêz a Şamê ve tên kirin, ji aliyê jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe ve hate şermezarkirin her wiha çalakî, komxebat, kampaniyayên raberkirina piştgirî û hevgirtina xwe dan nîşandan. Girêdayî hevgirtina jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi jinên Elewî û Durzî re Hevseroka Meclisa Gelan-Efrîn Mûşîre Mele Reşîd bersiva pirsên rojnameya me dan.



**Di Siwêdayê de rewşeke him şer û hin berxwedanî tê jiyan kirin, bi vê yekê re jî me dît ku piştgiriyek mezin ji aliyê jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo destek dayîna jinên Elewî û Durzî çêbû. Gelo hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Piştî rûxandina rêjîma Esed û hatina hikumeta veguhêz ser Serweriyê, gelek bûyer û geşedanên dîrokî û hovîtî hatin jiyankirin. Ji Şehbayê bigire ku gelê Efrînê komkujiya duyemîn jiyan kirin, komkujiyên li ser Beravê Sûriyê ku xwestin gelê Elewî qir bikin, her wiha em niha dibînin tiştê ku l Siwêdayê tên jiyankirin ew jî bi heman ferasetê tê kirin. Hêviya gelan a ku wê ev hukumeta nû wê bi xwe re guhartinên erênî bîne, nebûn.

Di van komkujî, siyaseta qirkirin, koçberî û kiryarên dijmirovî de, yên ku herî zêde bûne qurabî û temen dane, jin p dayîk in. Ew dayîkên Elewî ku li ber cavê wan zarokên wan dihatin kuştin û sûrgûnkirin, di heman demê de bûyerên ku niha di Siwêdayê de diqewimin berdewamiya wan kiryara ye. Divê em ji rêzê li van bûyer û nêzîkatiyên hovane nenêrin, piratîk û kiryarîn herî hovane yên bê exlaq û bê wîjdan ku dilê mirovan bi saxî ji wan derdixistin, hatin kirin.

Jinên Bakur û Rijhilatê Sûriyê, rêxistinbûyêna jin a ku bûyer bingeh ji destkeftî û şoreşa heyî re. Li ser vê bingehê em dibînin ku li hember komkujî, desavêtin, kiryarên li ser jin, siyaset û pilanên li ser jin tên pêkanîn, dibin hêza têkoşîn û serhildanê. Mînaka wê jî me di serhildata Îranê a Jin Jiyan Azadî de dît. Ev yek bûye rastiya jina azad li çar aliyên cîhanê. Ev bicirûska ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye destpêkirin û bûye şoreşa jin a serdemê. Bi taybet di Sûriyê de bi taybet piştî van geşedanan jinên Durzî, Elewî, xisistiyanî û yên azadîxwaz, di rêxistin û sîstema jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xilasiya xwe dibînin. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê her wiha hemû tevger û rêxistinên jin yên herêmê bi hemû pêkhateyên xwe careke din ev yek tekezkirin ku ew ji bo tevahî jinên bindest û yên ku rastî kiryaran tên, têkoşîn dikin. Raberkirina piştgiryekekî moralî û pratîkî ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê, nîşaneya hevgirtin, aştî û demokratîkbûna Sûriyê ye.

**Îro li Siwêdayê jin xwe birêxistin dikin û di nava şer de cihê xwe di parastinê de digirin, bi nêrîna we ev yek îlhama xwe ji şoreşa jin a Rojava girtiye?**

Dema em dibêjin Şoreşa Jin a Rojava bûye çirûske hêvî û hêza hemû jinan, ev yek xwe di birêxistinkirina jinên Siwêdayê de tê îsbatkirin. Dema jinên Siwêdayê li hember komkujî û ew kesên hov serî radikin û xwebirêxistin dikin, ev yek cihê serbikindiya hemû jinên têkoşer e.

Jinên Siwêdayê ji destpêka Avakirina Xweseriya Demokratîk ve, em şahid bûn ku a herî zêde dengê xwe tevlî vê projeyê dikir û piştgirê dida, ew bû her wiha bang dikir ku ev sîstem gel wan jî bê avakirin. Em niha dibînin ku bi van komkujî û siyasetên qirkirinê re berxwedaniyek û têkoşînek bê hempa ji aliyê gelê Durzî ve tê meşandin. bi tayebt jinên Durzî li Siwêdayê xwe birêxistin dikin û hêza xwe a parastinê dane avakirin û mil bi mil li kêlek mêr û malbatê şerê xweparastinê dimeşînin. Îro Hêza Xweparastinê a Jin li Siwêdayê hatiye avakirin, bê guman ev îlhama xwe ji cihê ku şoreş bi pêşengtiya jinê lê pêşketiye, ji Rojavayê Kurdistanê digre ku bandora vê şoreşê û pêşengtiya jin li jinên Durzî kiriye. Îro jina Durzî bi vê sekna xwe helwesta xwe li hember komên çeteyan yên ji bilî fikarên DAIŞ, Cîhadî û destdirêjiyê di hişê wan de nîn, raber dikin. Bê guman daxwaz û hêviyên gelê Durzî û yên hemû pêkhateyên Sûriyê jî ne ku sîstemekî olperest û yek alî bê avakirine. Hêviyên hemûyan jî ew bû ku Sûriyê di nava aştî, aramî û pirrengiyê de jiyan bike bû.

**Divê jinên Sûriyê bi tevahî di çarçoveyeke çawa de xwe birêxistin bikin da ku nebin qurbanê van hişmendî û nêzîkatiyên olperest, nijadperest û dijmirovî?**

Di nava nearamî, pirsgirêk û kirîzên ku tên jiyan kirin de, ne gengeze ku mirov bê parastin bikaribe jiyan bike. Ez dîsa dixwazim bal bikşînim ser Rojavayê Kurdistanê ji ber hêza yekemîn a ku karî xwe di nava 14 salên tijî qirkirin, şerên navxweyî û talankirinê de xwe parast û bû nimûneya herî serkeftî, ew jî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Ger li vir stratejiya xweparastinê nebûya wê rewş ne ev bûya ûû wê komkujiyê herî mezin para gelê Kurd bûya. Ji ber mînakên weke DAIŞ, komên çete, dewleta Tirkiyê û bi sedan aliyên ku dixwatin vê yekê pêk bînin hebûn. Lê hemû jî têk çûn û serkeftin hate jiyankirin.

Di Kobanê de êrişa herî yekemîn li ji aliyê DAIŞ’ê ve hate kirin, ger jinê di wir de xwebirêxistin nekiriba, dibe ku denge ne ev bûya, her wiha Efrîna dorpêşkirî ku her roj dixwastin êriş bikin lê di wir de xweseriya xwe avakirin û rêxistinbûna jin di asta herî pêşeng de pêvajo birêve dibir. Û bi hezaran mînakên wisa hatin jiyankirin, lê di encama jinên xwebirêxistinkirî û giyanên ku canê xwe feda kirin em bûn xudiyê van destkeftiyan.

Çalakî û xebatên siyasî û dîplomasî yên ku ji aliyê jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo jinên Siwêda tên kirin, ev dibe piştgiriyeke ji bo pêşeroja jina sûrî. Li ser wê bingehê divê jinên Sûriyê bibin yek deng û rêxistina xwe xurt bikin, ger rêxistinbûyîn axwe xurt nekin, wê ev civak rastî komkujiyên mezintir were. Di destura Sûriyê de divê helwesta jina Sûrî diyar be, nabe bi vê rengê heyî bê qebûlkirin k utu mafê jin tê de nîne. Divê mafê pêkhate û baweriyan bê parastin, da ku jin jî di nav de xwebirêxistin bike. Ger em îro ji bo piştgiriya jinên Sûriyê têkoşîn dikin û helwesta xwe diyar dikin, divê jina Sûrî jî rastiya xwe bizanibe û heq û hiquqên xwe bidest bixe. Ev yek jî bi yekgirtina jinan û birêxistinkirina xwe li ser asta Sûriyê pêkan dibe.

# Jin bi vîna xwe hişmendiya zilamê serdest têk bir



**Amara Baran**

Asta ku şerê me yê azadiyê îro gihîştiyê nîşaneya jiyana azad e ku her kes li dora wê kom bûye. Xeyala vî şerî, coş, kelecan, hêz, hişmendî û ruhê ku bi milyonan jinên azadîxwaz dighîne hev. Xwegihandina rastiya gelekî şerker, nîşaneya pêşengî û têkoşîna jina şoreşger e. Tişta di vir de girîng ew e ku ne tenê mîrateya dîrokê ji me re hiştiye, lê xwegihandina wê ferasetê ye ku ancax bi pêşengiya jinên azadîxwaz jiyaneke bi rûmet were avakirin. Jina ku ji bo azadiya xwe têdikoşe û li hemberê zîhniyeta desthilatdar û kujerê jiyanê serî netawand û got ku berdêl çi dibe bila bibe, lê em ê heta dawiyê li hemberî her cûre destdirêjî, qetilkirin û tundiyê xweparstinê esas bigrin û têbikoşin.

Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi şoreşa jin tê naskirin li tevahiya cîhanê bi silogana Jin Jiyan Azadî, jinan careke din ispat kir ku bi pêşengtiya jin hebûn û nasnameya civakê tê parastin.

Di şoreşa Rojava de jina Kurd ji destpêka şoreşê ve di hemû beşên jiyanê de rola pêşengtî girtiye. Jinên ku qet çek ranekiribûn ji bona parastina hebûn û nasnameya xwe çek rakir û di çeperan de singe, sing li hemberê çeteyên DAIŞ’ê û hêzên piştgiriya wê dikin cihê xwe girt û bi lehengî şer kir û mohra xwe li dîrokê xist.

Îro careke din di komkojiyên berava Sûriyê û yên ku li ser Durziyan li Siwêdayê hatî meşandin û komkujiyên ku li ser jinê pêk hatin, herwiha revandin û tecawiza li ser jinê hate kirin; careke din da xuyakirin ku heman hişmendî di serî de li ser jinê û civakê tevahî tê meşandin. Jinan dît ku ji bilî xweparastinê rêyeke din ya têkoşînê tuneye. Berxwedana jina Rojava ji bona jina Elewî, Durzî û jî tevahiya jinan re bû ilham û çavkaniya berxwedanê û riya têkoşîna azadiyê. Yek wan jinên ku bûne sembola jinên berxwedêr li Siwêdayê jina bi navê Fewziye El Şeranî ye ku heta dawiyê li hemberî zîhniyeta qirker liber xwe da. Berxwedana YPJ’ê ji bona tevahî jinên têkoşer bû riya xweparastinê û têkoşîna li hemberî hişmendiya zilamê serdest û qirkirina ku li ser jinê tê meşandin.

Komkujiyên ku di sala 2014’an de çeteyên DAIŞ’ê li ser jinên Êzîdî li Şengalê pêkanîn, îro heman komkujî ji milê çeteyên HTŞ’ê ve li ser jinên Elewî û Durzî jî têne meşandin û gelek jin rastî tecawiz, Kuştin û destdirêjiyê hatin. Li Şengalê nêzê sê hezar jin ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hatin revandin û firotin û heta niha jî aqûbeta gelek jinan nediyare. Îro jî hijmarek zêde jinên Durzî jî ji aliyê HTŞ’ê ve tên revandin û firotin, ev jî encamê hişmendiya zilamê serdest yê ku vîn û hebûna jinê napejirîne û her tim dixwaze wê di bin serweriya xwe de bigre. Jina serhildêr li pêşiya zilamê desthilatdar wek kelemekî radiweste.

Berxwedana her jinekî dibe mezinkirina têkoşînê, Rêber Apo ji bo xweparastinê wiha dibêje” xweparastin, ewlekariyiya civaka ehlaqî û polîtîke” ger em îro behsa têkoşîna xweparastina ewlekariyê li Bakur û Rohilatê Sûriyê dikin mijara herî girîng ya ku jin li hemberê wê têdikoşin; pergala desthilatdar a zilam e. Pirsgirêkên jinan li tevahiya Kurdistanê kêm zêde dişibin hev, li Bakur û Rojhilatê sûriyê jina Kurd, Ereb, Sûryan Êzîdî û hwd.. bi remanê xwe yê azad hişmendiya DAIŞ’ê têk birin.

Bi pêşengtiya jina Kurd jinên Rojava bi berxwedaniya xwe destanên dîrokî xêzkirin. Di 8’ê Kanûna 2024’an de dema ku çeteyên HTŞ’ê û Dewleta Tirk bi awayekî hovane êrîşkirin û careke din bi dagirkirina Rojava re xwestin ku xeyalên xwe yên osmanî pêk bînin. Lê bi berxwedaniya jinan têkçûn, yek ji wan mînakan ku cîhan jê re şahidî kir li bendava şehîdan ku mohra xwe li dîrokê xist, gelek jinên pêşeng bi hêz û vîna xwe pêşengtî ji felsefeya jiyana azad re kir û ji tevahiya jinan re bû îlham. Ji bo parastina av, ax û enerjiya xwe jinan pêşengtî ji meşa azadiyê re kir. Jinên pêşeng yên ku canê xwe fedayê parastina axa xwe kirin, gotin ku “Ji bo parastina welat canê xwe fedakirin, ji bo me rûmet e” di heman deme de dayîkin ku gotin “ Em ji mirinê mezintirin jî hebûn. Jinên Rojava li ser bîrdoziya Rêber Apo xwe parastin esas girtin û di her qada jiyanê de îradeya xwe ya azad derxistin pêş, di serî de qada xwe ya parastinê ji serweriya mêr rizgar kirin û bûn xwediyê çalakiyên herî xurt ku derbeyên giran li pergala desthilatdariya zilam xistin û têkbirin.



# Şoreşa kurdistanê li benda wêjevanên xwe ye!

**Cîger Efrîn**

“Me xwest ku em vê xebatê ji torevanan re bihêlin, lê wisa xuya dike ku em neçar in wêjeya vê xebatê herî baş bi xwe pêk bînin” (Rêber APO). Ya rast jî ew e! Ji ber ku yên hemû zor, zehmetî û dijwariya kêliyên şoreşê jiyane, milîtan, xebatkar û kadroyên şoreşê bi xwe ne û ji wan baştir jî kesek nikare êşên wan bi lêv bike!

Ji bo nirxên şoreşa Apo’yî û paradigma Modernîteya Demokratîk mayînde bibin, pêşxistina wêjeya şoreşê pêwîstiyeke şoreşgerî û dîrokî ye. Xebata ku felsefa Rêbertiyê di nava civakê de bide rûniştandin û kesayeta ku em wekî Tevgera Apo’yî dixwazin biafirînin, ancax bi wêjeyê gengaz be. Şoreşa bi tenê li ser lingê leşkerî-siyasî nikare bi awayekî têkûz bimeşe, ango lingê bingehîn kêm dimîne. Li Soveytê beriya şoreşê, wêjeyeke Rûsan a xurt hebû, Lenîn li ser wê bingehê şoreş pêş xist. Lê mixabin beriya Tevgera Azadiyê ji bilî Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî, Şivanê Kurd ya Ereb Şemo û helbestên Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran û hin helbestên sedsala 19’an û 20’an hema bêje li ser navê wêjeyê tiştek tune bû. Ji xwe yên hebûn jî ji ber ku xwendin di civaka me de pir û pir kêm bû, kesî zêde nexwendibû. Bi dirêjiya şoreşa Apo’yî de nexurtbûna wêjeyê xwedî cihekî girîng e. Heger beriya destpêkirina şoreşê wêjeyeke me ya zexm hebûya an jî beriya salan wêjeyeke xurt derketa, wê kesayeta şoreşgerî jî zûtirîn dem bihata afirandin û jiyana partiyê şîlo nedibû. Ji ber ku wêje di heman demê de rexnekirina her tişta derveyî civakbûniyê ye û raberkirina ku tê xwestin e. Ango wêje; dahûrandina civakê ji her hêlê ve digire dest û torevan jî li gorî xeta şoreşê dahûrandina civakê çêdike. Li Sovyetê, Lenîn hêj ji destpêkê de ji bo ku wêjeya şoreşê pêş bixe, komisyonan didin avakirin, karê wan jî wekî di nav gel de lêkolîna wêjeya civakî û bi nirxên şoreşê re keljandin û li gorî wê jî pêşxistina têgîn û têgehên şoreşê diyar dike. Ew komisyon digihe 35-40 kesî (pişt re hêjmar zêdetir dibe, digehe 400-500 kesî) û li seranserê Sovyetê belav dibin, derbarê şoreşê û çanda civakê de daneyan berhev dikin. Pişt re wan li gorî bîrdoziya xwe distrên û dikin berhem. Heta sala 1927’an 8 berhemên baş derdixin. Bi serdestiya Stalîn re êdî hêdî hêdî dogmatîzim serdest dibe û ji wê û pê ve, rê li ber afirîneriya wêjeya şoreşgerî tê girtin. Ji sala 1927’an û heta sala 1933’an gelek rewşenbîr, helbestvan, romannivîs, senarîst, înthar dikin û gelek jî ji Sovyetê baz didin û diçin Ewropa û DYA’yê. Ji ber ku komisyona heyî bigota ”ev berhem, ev filma nebaş e”, ew berhema çi dibe bila biba, nema dihate çapkirin û weşandin.




Ji xwe heger mirov bêje, ji sedemên ku Sovyet hilweşî yek ji nepêkhatina sosyalîzmê di nava civakê de rêgirtina li wêjeya civakî bû, wê ne şaş be. Çimkî Stalîn bi tenê rê dida yên ku pesna wî didin û tu rexneyê ji karwariya wî re nakin. Halbûkî wêje ji beriya her tiştî rexnekirina şaşitiyên desthilatdaran û şêweya nermkirina bîrdoziyê bi awayê ku civak fêm bike û kes jî li gorî karekterên di wêjeyê de têne pêşkêşkirin xwe nû bike û li gorî karekterên di roman û feraseta di helbestan de awa bide xwe; ango wêje, rêya kesayetên ku wê nirxên şoreşê bi civakê bide xwarin vedike û bêyî ku mirov biêşîne, bi awayê herî nerm û xweş mirovan bi nirxên şoreşê ve dide girêdan, derdixe holê. Damarên felsefa şoreşê bi rêya wêjeyê di nava civakê de xwe ber dide kûrahiya civakê. Wêjeyeke ku tişta heyî rexne neke, rêya rastkirinê nîşan nede, ne wêje ye. Li Çînê jî Mao kete nava wê hewldanê. Yek ji armanca “Şoreşa Çandê” jî ew bû. Her çiqasa bû hêviyek ku rê ji guhartin û veguhatinan re veke, lê di demeke kurt de dagerî hêza tesfiyekirina kesan û çanda civakî. Bi dirûşmeya “na ji her tişta kevn re”, şoreş ji rastiyên civakê qut bû. Ji lewra jî tesfiyeyên herî mezin di navbera sala 1966-1976 pêk hatin şoreşa Çînê bi temamî ji xeta sosyalîzmê dûr ket.

Li Kuba jî û dewletên din yên bi bîrdoziya sosyalîzma ku bidestxistina dewletê hatibûn damezrandin, heman encam derkete holê. Ji ber ku kesayet nehate avakirin, hişmendiya dewletê bi rêya wêjeyê nehate verişandin, berevajî wê bi wêjeyê dewlet hate mezinkirin.



Bi kurtasî em dibînin ku, di her şoreşê de salên pêşîn berhemên baş derketine, lê ji ber ku rê ji wêjeya realîst re hate girtin, ew giyana şoreşgerî bi demê re hatiye fetisandin û mirî ye. ji wêjeya civakî pirtir, wêjeyeke ku, dageriye navgîneke ku her tişta rêveberên partiyê-dewletê dikin rewa bike, pesna rêveberan bide û temenê dewletê dirêj bike. Wêje ji wêjebûnê derxistin û wêje kirina navgîneke ajîtasyonê û propagandayê. Bê guman ji ber ku dewlet û mezinkirina dewletê armanc bû, wêjeya civakî bi pêş neket, giyana bîrdozî ya sosyalîst nebiriqî nirxên ku şoreşê derxistine holê. Bi taybetî jî di mijara jin û malbatê de, pergala berê ya ku hebû derbas nekirin. Jin dîsa xistin mal û serdestiya baviksalarî domandin.

Halbûkî karê wêjeyê ne ew bû. Rêber Apo erka wêjeyê li gorî rastiya dîrokê wiha zelal dike; “Erka wêjeyê çi ye? Ango pêwîst e bi giştî huner, bi taybet jî wêje û dîsa ew romana ku beşek girîng a vê yekê ye bi pirsa ka erka şoreşgerî çi ye, ku em bibersivînin. Ger huner nebe em nikarin qala civakan bikin. Lewma huner, amrazekî jêveneger e, ji bo civakbûyîn û pêşketina civakî. Bi taybetî, ji ber ku mirov nêzîkatiya xwe ya li hember xwezayê bi zanistî û bi polîtîkayê tam nikare dahûrîne û nikare giyana xwe bi têrbûyîneke daringî têr bike, wî ber bi teşeyê têrbûyîbûneke cewaz, yanî ber bi hunerê ve dibe. Di vê wateyê de huner, derbaskirina pêdiviya giyanê esas digire. Bê guman peywendiya vê bi ramanê ve heye. Bi hêsanî mirov dikare diyar bike ku huner, warekî pir xweser derbirîn dike.” Heger em bandora mîtolojiyê ( ya rahîbên Sumerî) çawa bêyî ku zorê li mirovan bikin, ew xistin bin bandora xwe û ev bû 5 hezar sal in hêj jî mirovahî ji bin bandora wêjeya (mîtolojiya) wan derneketiye, bînin ber çavên xwe, em ê baştir rista wêjeyê bibînin.

Bi kurt û kurmancî, ji bo me karê wêjeyê ya bingehîn; raxistinkirina heqîqetên dîrokî li gorî heqîqeta civakî, derxistina rastiya jin-dayîkê ya ku pênç hezar sal in bindest e, berçavkirina wêrankeriya serdestan a li ser xwezayê, parastina xeta Rêbertiyê ji ferasetên lîberal û xwegihînek (oportunîst) û bilindkirina manewiyetê ye. ji lewra jî li dijî pergala Modernîteya Kapitalîst a ku madiyetê derdixe pêş, jin xistiye asta herî jêr, mêzîna ekolojîk xera dike û manewiytê dikuje, girîngiya wêjeyê qatekî din zêde bûye. Bi taybetî di rewş û mercên Kurdistanê û gelê Kurd de ancax rastiyên civakî yên ku Rêber Apo bi têkoşîneke bêhempa û xwîna pakrewanan derxistine holê û dagirkeriya qirker a neyaran, heqîqeta jinê û hevjiyana azad bi wêjeyê dikarin werin zelalkirin. Her wiha bersiva “malbateke çawa?” jî bi wêjeyê mirov dikare di nava civakê de belav bike. Çimkî zimanê siyasetê bê ruh e û ji dilînan pirtir xîtabî aqil dike. Lê wêje hem xîtabî dilînan dike û hem jî xîtabî aqil dike. Ango wêje mirov dide fikirandin. Ji xwe gava bersiva “malbateke çawa?” were dayîn bi awayekî xwezayî bersiva “civakeke çawa” jî derdikeve holê. Belê, ji bo ku tişta hatî serê şoreşên berê neyê serê me, pêdiviyeke lezgîne ku wêjeya Şoreşa Kurdistanê were rêxistinkirin û şoreş têgîn û têgehên xwe derxîne. Nexwe em nikarin xeta şoreşê ya komînal û civakî biparêzin. Bê guman hinek gav hatine avêtin, lê hêj jî nebûne bersiv ji berhem û nirxên ku şoreşê derxistine holê re. Şoreşa Kurdistanê li benda wêjevanên xwe ye.



## Jiyana weke helbestê

**Remezan Olçen**

Dema ez diçûm dibistana navîn min di pirtûkeke li ser Almanyayê de tiştek xwendibû. Behsa jiyana piştî Şerê Duyemîn ê Cîhanê dikir. Ji bo rabûna ser piyan a welatekî tê de gelek tiştên ecêb dihat gotin. Lê çend hevokên wê pirtûkê di hişê min de rûniştî man. Min qet ji bîr nekir.

Digot; Di şer de zilhêzên cîhanê tenê şerê Naziyan nekirin. Şerê bajêr, dar û deviyê Almanyayê jî kirin. Welat xera û wêrankirin.

Piştî şer Almanya bûbû kavilistan. Lê diviya me bi awayekî welatê xwe rakira ser piyan. Ji bo vê jî me du tişt kirin. Yek me firin çêkirin û me zikê civaka xwe têr kir. Em di milê hev de xebitîn. Lê me bi firinan re dikên şanoyê jî çêkirin. Bi rêya hunerê me dest bi pêngavên serwextkirina civakê kir. Zikê xwe bi awayekî bin anî be jî têr dikir lê diviya dil û mêjî jî têr bibûna.

Mesela ku di pirtûkê de dihat gotin kêm zêde wisa bû. Îcar heke em li xwe û li rewşa xwe vegerin gelo em çawa dikarin ji vê meselê ji xwe re dersan derxin. Çima vê dibêjim? Ji berk u bi Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk Rêber Apo paradîgmayê guhert, şêwaza rêxistinbûnê guhert heta dawî li şêwaza têkoşînê anî. Ew têkoşîna ku 41 sal li dû xwe hiştî. Ev bûyer û wakiayên pir mezin in. Madem wisa ye; gelo em ê çawa bikevin sûreta vê meselê? Em ê civaka xwe li gorî vê paradîgmayê birêxistin bikin. Bi rêya çi? Helbet bi rêya hunerê.

Hunera ku li ser kok û rehên xwe ye, gotina ku aydî xwe ye dikare vê rêxistingeriyê pêş bixe. Dikare civaka demokratîk çêke. Kakil û cewherê xwe kom û komîn e. Bi rêya her beşên hunerê ku xwe li ser esasê komînê birêxistinkirî hem xwe hem jî civaka xwe dikare biguherîne û veguherîne. Bi vî awayî dikare bibe bînak ji qada polîtîkayê re jî. Te dî gotineke meşhûr e, dibêje; divê poetîka li pêşiya polîtîkayê be. Li ser vê gotinê jî difikirim. Yanî çi? Yanî divê huner şikil bide jiyanê, bide danûstanina mirov bi mirovî re, mirov bi xwezayê re.

Li qadên şoreşê li Rojava, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê em dibînin ku tevgera çand û hunerê xwe weke komîn bi rêxistin kiriye. Ji ber wê jî xebatên dikin weke şahkarên civaka demokratîk a hemû pêkhateyên li herêmê xuya dike. Di vir de ya esas çi ye. Çawa ku helbestvanek di hemû jiyana xwe de helbestvan e, ev terzê komînên hunerê jî divê di hemû demên jiyanê de bi heman awayî be. Weke dibêje, weke nîşan dide divê bijî. Hingê dibe mînak, hingê esas tê girtin. Hingê poetîka dikare teşeyê bide polîtîkayê. Ma ne polîtîka birêvebirina jiyanê ye. Hingê divê em jiyana xwe weke helbest, weke straneke xweş bijîn. Wê demê jiyan digihîje heqîqeta xwe, hebûn azad dibe.

# ‘Hikumeta veguhêz nikare baweriya gelên Sûriyê qezenc bike’

Endama Yekîtiya Ragihandina Azad Ahîn Dêrik diyar kir ku piştî van komkujiyên ku li dijî gelan di hundirê Sûriyê de têne kirin û hikumeta veguhêz a Şamê cihê xwe di nav de digre, nema baweriya gelan bi vê hikumetê tê.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Di derbarê komkujiyên ku li ser gelên Sûriyê tên kirin û hilgirtina jina Durzî ji çekê re û tevlîbûna wê ji nava berxwedanê re Endama Ragihandina Azad bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:



**-Derbarê komkujiyên ku li ser Elewi û Durziyan têne kirin de her çendî hikumet hewl dide xwe ji vê yekê bê sûnc nîşan bide, lê ev komkujî raste rast bi destê wê hatin meşandin û êdî baweriya gelê Sûriyê bi hikumetê nemaye, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Komkujiyên ku li dijî Elewî û durziyan tên kirin, em wek gelê kurd van komkujiyan şermezar dikin, necara yekeme ku komkujiyên bi vî rengî bi taybet li sûriyê tên kirin. Piştî hilweşandina rêjîma Baas a ku bi salan zilim û qirkirin li ser gelan dida meşandin, lê bi hatina hikumeta veguhêz ya şamê re li seranserî Sûriyê rewşa heyî ji berê xirabtir bû û baweriya gel bi vê hikumetê nayê. Êriş û komkujiyên li ser Elewî û Durziyan tên kirin û gefên li ser kurdan sûriyê berû parçebûnê ve dibe. Êriş û komkujiyên li ser pêkhateyan têne meşandin li ber çavê cîhanê têne meşandin û her ku diçe aloziyên heyî li herêmê dijwartir dikin. Komkujiyên ku HTŞ’ê dide meşandin û yên ku DAIŞ’ê dide meşandin xwedî heman hişmendiyê ne.

Ev êrişên hovane dihêle tevahiya netewên li Sûriyê dijîn bikevin nava metirsiyê û Sûriyê berû parçebûnê ve bibe. Em îro li Sûrî di pêvajoyeke nû re derbas dibin, bi taybet piştî hatina hikumeta şamê ya veguhêz êdî pêvajoyekî nû ya bi şer û pevçûnan gur dibe, ev yek li pêşiya cîhanê tê kirin û dîmen tên dîtin û bi fermana Hêzên hegemonîk tev digerin. Dixwazin Sûrî bikin qada şerekî dem dirêj, li Sûriyê komkujî û sûcên dijmirovî roj bi roj zêde dibin, tevî vê yekê jî tu kes dengê xwe nake û ne jî dewletên Navnetewî helwestên xwe nîşan dikin. Raste carnan daxuyaniyan didin, lê ev yek cidî nayê girtin û axaftin tenê li ser kaxezan dimînin. Piştî van kiryaran êdî baweriya gel bi vê hikumetê nema ye, ji ber ku ev kiryarên ku tên kirin bi destê wê hatin meşandin û di encamê de bi hezaran gel hatin kuştine, gund hatin wêran kirin, mal û milê gel hatin talan kirin.

**- Eger rê li pêşiya komkujiyan neyê girtin wê rewşa Sûriyê ber bi kûve biçe, çime cîhan li hemberî sûcên dijmirovî yên ku hikumeta veguhêz li ser gel dide meşandin dengê xwe nake ?**

Tê dîtin ku hêzên cîhadîst dixwazin yek tiştî tenê belav bikin di Sûrî de, ew jî hişmendiya mezhebî ye, ev yek rê li ber gelek komkujiyên nû vedike, rewşa Sûrî ber bi parçebûnê ve diçe. Li Sûriyê rojane komkujî, revandin, talan û wêranî û li ber çavê cîhanê tevahî tê meşandin, lê weke ku rewşeke ji rêzê ye, ne kes hesab ji hikumetê dixwaze û ne kes dengê xwe jêre dike. Li hemberî vê yekê pêwîste ku li seranserî Sûriyê yekîtî û hevgirtina gelan pêkwere û gelê Sûriyê tevahî ji bona siberojeke demukrat û aşîtiyê dest bidin destê hev.

Lê mixabin li ser erdê ev yek nayê kirin û berûvajê wê zimanê dijberiyê û sorkirinê di nava gelan de dirdikeve pêş, li pişt şer û komkujiya ku li ser gel tê meşandin dezgehên ragihandinên heremî û biyanî jî hene. Bi riya şerê taybet û derûnî yê ku di serî de bi riya belavkirina agahiyên nerast û gurkirina şerê mezhebî û olî bi armanca parçekirina Sûriyê û derxistina şerê navxweyî ev yek tê kirin.

Li gorî vê rewşa ku li Sûriyê tê jiyan kirin helbet riya tekane ya ku çareserî û aşiyê bi xwere bîne holê sistemê rêveberiya xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Ji ber ku pirojeya Netewa Demokrat hêvî û çavkaniya jiyanê ye ji bo gelek civakan, hat dîtin jî ku hîn rejîma Baas li ser desthilatdariyê bû gelê Siwêda bang dikir ku em



Rêveberiya Xweser dixwazin û heya roja îro jî ev daxwaz berdewam dike.

Di ber van komkujiyên ku li seranserî Sûriyê têne meşandin hikumeta vekuhêz ya Sûriyê berpirsyare û pêwîste tevahî gelên herêmê û cîhanê zextê lê bikin, ji bona ku dev ji vê hişmendiyê berde. Herwiha pêwîste destûreke nû ji bo Sûrî were danîn û pêwîste ku mafê hemû gelên Sûriyê were parastin û di siberoja Sûriyê de misoger bibe.

**- Li hemberî komkujiyên ku ji milê hikumeta veguhêz ya Sûriyê û komên girêdayî wê li ser Durziyan hatin meşandin, jinên Durzî jî cihê xwe di nava şer û berxwedanê de girtin, heyanî çi astê bandora jinên YPJ’ê li ser tevlîbûna wan hebû?**

Helbet dema ku em behsa Şoreşa Rojava dikin, yekser Şoreşa jinê tê bîra mirov û bi bandora vê yekê li ser tevahiya jinên Sûrî û cîhanê jî hebû. Berî niha jî dihat dîtin ku jinên li Siwêda bang li jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikirin û bi taybet jî jina kurd, jina ku bi fikrekî azad xwe birêxistin kiribû û bû mînak ji tevahî jinan re. Dema gelê Siwêda li dijî rêjîma Baas derketin jî bang li jina li Rojavayî Kurdistanê dikir, gavên ku jina kurd di Şoreşa Rojava de avêtin bû nimûne ji tevahî jinên cîhanê re. îro jinên Durzî heger bi jina kurd bandor nebûna, cesaret nedigirtin ku çekê hilgire û axa xwe biparêze. Jinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe isbat kir, roleke mezin di avakirina civakê de lîst, ji ber ku jin gihiştiye wê astê ku netenê bibe rêvebera xwe yan rêvebera navendekî, lê wê xwe isbat kir ku dikare welatekî birêve bibe, lewma hertim dijmin wê dike hedef, ji ber ku ji hêz û îradeya wê ditirse. Tevî hemû komkujiyên li dijî jinan hatî kirin jî, jina kurd rolekî gelekî girîng list û di hemû warên civakê de xwe bi rêxistin kir û di asta pêşengiyê de cihê xwe digre.

# Hêviyên bi destan tên çêkirin

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Meryem Osman destnîşan kir ku her berhemek bi destan tê çêkirin, bi îradeyeke mezin tê temamkirin û wiha got: “Projeya me ji bo teşwîqkirina jinên ciwan e, da ku ji şêwazê jiyana kevneşopî derkevin û di her warekî ku jê hez dikin de xwe pêş bixin.”**

Di 10 salên dawî de jin li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê karîbû rola xwe di civakê de vgerîne, ji çarçoveya rolên kevneşopî derxist û hebûna xwe di hemû warên jiyanê de îsbat kir, di nav de karên destan ku di dema heyî de bûye qadeke afrîner û serxwebûnê. Karên Destan veghurî wesîleyeke ji bo îfadekirina nasnameya çandî û kesayetî, ev jî weke berhemek ji berhemên şoreşê bû.

Meryem Osman jineke 37 salî ji bajarê Qamişlo ye, ji zaroktiya xwe ve ji karê destan hez dikir û ev hezkirin pê re mezin bûye heta ku ew gihaşt projeyeke ji bo piştgiriya jinan. Ew ji peymangeha karê destan a Şamê derçû ye, piştre vedgere bajarê xwe ji bo jêhatiya xwe berdewam bike, lê hin sedem li pêşiya wê derketin hişt ku dûrî jêhatiya xwe bikeve, lê piştî 10 salan ji nû ve li karê xwe vegeriya.

**Proje veghurî cihekî piştgiriya jinên ciwan**

Mereym Osman dibêje ku hevala wê piştgiriya wê kir da ku li karê xwe vegere û wiha got: “Bi piştgiriya hevaleke min, me bi hev re projeyek taybet li bajarê Qamişlo da destpêkirin. Ji malê me destpê kir weke neqişan û morîkan, piştre veghurî dikaneke ji bo frotina berhemên xwe. Herwiha em piştgiriyê didin jinên ciwan ku berhemên xwe yên destan bînin dikana me da ku em ji wan re pêkêş bikin.”

Meryem Osman destnîşan kir ku armanca wan ne ne tenê ji bo frotinê ye, lê belê weke ciheke ji bo taşwîqkirna jinan ku ji şêwazê jiyana kevneşopî derkevin û di her warekî jê hez dikin de xwe pêşbixin.

**Zehemtiyên li hember projeya wan derdikevin**

Meryem Osman diyar kir ku ji zehmetiyên ku tên pêşiya wan, kêmaniya madeyên çêkirina karê destan e û wiha anî ziman: “Em



neçar dimînin ku ji dervî Qamişlo bînin weke Başûrê Kurdistanê û Îranê, lê tevî van pirsgirêkan her berhemek bi îradeyeke mezin tê çêkirin.”

Meryem Osman bawer dike ku di her berhemeke ku bi destan tê çêkirin giyaneke tê de heye û her hunermendek parçeyeke ji kesayeta ji xwe dixe nav de.



# Bi armancgirtina jin û ciwanan dixwazin civakê pûç bikin

Bikaranîna jin û ciwanan ji madeyên hişbir re bûye terzê sermayeyê û bêyî ku ciwan bikevin ferqa vê siyasetê, jêre dibin amûr; valaderxistina şerê taybet û derûnî, encax bi rêya perwerde, têgihiştin û xweparastinê pêk were.

**Zana Roj/Qamişlo**

**Bandora bikaranîna Madeyên Hişbir di civakê de**

Pirsgirêka madeyên hişbir pirsgirêkek girîng e ku li seranserî cîhanê girîngiyek zêde bi dest dixe, ji ber bandora wê ya kûr li ser civakan û tenduristiya kesan. Madeyên hişbir gelek bandorên neyînî çêdikin, bandorê li tenduristiya laşî û derûnî dikin û dibin sedema pirsgirêkên tenduristiyê yên kronîk ên wekî depresyon, fikar (Qeleq) û nexweşiyên dil. Bikaranîna madeyên hişber bi zêdebûna metirsiya nexweşiyên vegirtî yên wekî HIV û hepatît, bi taybet di nav ciwanan de.

Herwiha, bikaranîna madeyên hişber dibe sedema hilweşîna malbatan û rêjeyên sûc zêde dike, ji ber ku tiryak carinan ji bo fînansekirina adetên xwe li pereyan digerin û ev yek dibe sedema zêdebûna dizî û sûcên din. Ev diyarde di heman demê de dibe sedema têkbirina têkiliyên civakî û zêdebûna zextên aborî li ser kesan û malbatan.

Lêkolîn nîşan didin ku lêçûnên (Tekelîf) aborî yên bikaranîna madeyên hişber barê tenduristiyê, zêdebûna lêçûnên li ser bernameyên lênerînên civakî û kêmbûna hilberînê vedihewîne. Çareserkirina van pirsgirêkan bersiveke berfireh ji hemû aliyên peywendîdar di nav de hikûmet, rêxistinên civaka sivîl û sektora taybet, hewce dike.

Ev lêkolîn bandorên civakî û aborî yên îstismara madeyên hişbir vedikole û analîzek berfireh li ser bingeha lêkolîn û xwendinên heyî pêşkêş dike. Her wiha pêşniyarên pratîkî ji bo baştirkirina stratejiyên pêşîlêgirtin û dermankirinê di nav de xurtkirina hevkariya di navbera saziyên cûrbecûr de û pêşxistina bernameyên perwerdehî û hişyariyê yên bi bandor, dihewîne.

Tê zanîn ku madeyên hişbir wekî madeyên xwezayî an sentetîk têne pênasekirin ku kîmyaya mejî diguherînin. Ew bi bandorên cûrbecûr bandorê li tenduristiya laşî û psîkolojîk dike, di nav de hestên çalakiyê, an jî bêhalî û rihetbûnê. Bikaranîna berdewam a van madeyan dibe sedema kontrola tevahî ya li ser pergala demarî (Cîhaz el Esabî) ya kes. Ew dibe sedem ku laş fêrî wê bibe ku wekî tiryakbûn tê zanîn, her wiha dibe sedema tevliheviyên tenduristiyê yên cidî û reftarên xirab ji bo kes û civakê.

**Bi giştî bandora bikaranîna Madeyên Hişbir li ser ciwanan?**

Ji aliyê civakê ve: Dema ku ciwan dest bi bikaranîna madeyên hişbir dikin, yekem tişt çembera civakî ya derdora xwe diguherîne. Ew berê xwe dide kesên ku vê yekê bikartînin her wiha ew xwe ji hevalên xwe dûr dixe û ber bi tenêtî û îzolasyonê ve diçe. Kes bi malbata xwe re jî diguhere.

Ji aliyê derûnî ve: Ciwanek bi xwezayî guherînên derûnî dijî, lê hebûna madeyên hişber di rûtîna wî ya rojane de kontrolkirina wê dijwartir dike. Ev yek dibe sedema paşguhkirina xwe him di aliyê derûnî de him jî fîzîkî û her wiha teslîmbûna ji rewşên dijwar re û çareserkirina wan bi meyla ji madeyên hişbir re.

Ji aliyê darayî ve: Bi giştî madeyên pir buha ne, lê ji bo care yekemîn kes bixin xefkê û di bikaranîna wan de asê bikin, bê buha didin. Lê bi berdewamiyê re mirov hewcedike ku tiryakê zêde bike, ev jî divê pereyên zêde bide. Bi vê yekê de bazirganên narkotîkê ango madeyên hişbir dihêle ku ciwanan ji hêla darayî ve îstismar bikin.

Ji hêla rewşenbîrî ve: Ciwanî qonaxek ji avakirina rewşenbîrî û kesayetî ye ku tê de pêkhatin û kûrbûna kesayetiyê di hundurê mirov de hîn bi cih nebûye û van madeyan bikar bîne ne tenê dibe sedema hilweşandin û têkçûna şaneyên mejî û derengxistina fêrbûnê, lê di heman demê de wan ber bi ramana neyînî û ji rê derketinê ve dibe.

Ji aliyê Exlaqî ve: Dema bikaranîna madeyên hişbir, aliyê mentiqî û aqilane yê mirov bi tevahî tune ye û haydariya wî ya ji tiştên li dora wî kêm dibe. Her wiha, mirov di bin bandora van madeyan de fêm nake ka çi rast e û çi şaş e.

Ji aliyê qanûnî ve: Bikarhênerên madeyên hişber ên di bin temenê 15 salî de divê li navendên tenduristiyê werin ragirtin ku li wir lênêrîna giran û çavdêriya tevgerî û piştgiriya dermankirina tiryakê werdigirin. Bi heman awayî, ciwanên di navbera 15-18 salî de li navendên ragirtina ciwanan têne ragirtin, ku ev bandorê li tomarên wan ên sivîl dike û wan ji gelek derfetên pêşerojê bêpar dihêle. Ev hemû ji bilî bandorên wê yên tenduristî yên ku me anîna ziman.

**Bandora Madeyên Hişbir li ser jinan**

Dema ku em behsa tiryakbûna



jinan dikin, divê civak pêşî zanibe ku ew nexweşiyeke ku sedemên wê mîna her nexweşiyeke din in, ne ku bêexlaqiyeke an nêzîkatiyên nebaş ên keç an jinekê ye. Jin jî weke her kesî dikeve bin zextên pîskolojîk û civakî û berê xwe dide madeyên hişbir. Divê jin bi bûyerên civakî û kesayetî yên ku berê wê didin bikaranîna van madeyan bandor nebe û nekeve xefka van diyardeyan. Ji ber vê yekê, dermankirina tiryakê jinan tiştekî xwezayî ye, ji ber ku mîna dermankirina her nexweşiyekê, divê dê û bav ji ber vê yekê şerm nekin.

**Bandora bikaranîna madeyên hişbir li ser tenduristiya laşî ya jinan**

Lawazkirina sîstema parastinê, Pirsgirêkên dil û damaran- Vereşîn û nexweşiyên made- Zêdebûna barê li ser kezebê- Zirara mejî û demaran- Nexweşiya kezeba nefesê- Guhertinên avahîsaziyê di laş de- Meyla nexweşiyên bi xwînê ve girêdayî.

**Gelo jin ji mêran bêtir ji Madeyên Hişber bandor dibin?**

Tê zanîn ku bandorên tiryakê li ser jinan ji mêran girantir e. Konseya Navneteweyî ya Kontrolkirina Madeyên Hişbir (INCB) nîşan daye ku gava jinek dest bi wergirtina madeyên hişbir an jî madeyên ku dikarin bibin sedema tiryakê dike, îhtîmala ku ew bi awayekî eşkere tiryakê bibe û zêdebûna pikaranîna madeyê bilêztir bike ji mêran mezintir e.

Her çend avahiya anatomîk (Teşrîhiyê) a organên navxweyî yên laşê mêr û jinan dişibin hev jî, Lê belê, laşê jinê dibe ku ji madeyên hişber bêtir hesas be û nîşanên tiryakê dikarin zelaltir xuya bibin. Her wiha, sîstema hormonal a di laşê jinê de tevlîhevtir û guherbartir e, ev jî dibe sedem ku bikaranîna madeyên hişber bi awayekî wêranker mudaxeleyî karê hormonal bike.

**26’ê Pûşbera 2024’an de raporek ji aliyê Neteweyên Yekbûyê ve hate belavkirin û naveroka raporê jî wehabû**

Raporek ji aliyê Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ya li dijî Tiryak û Sûc ve hat weşandin eşkere kir ku li cîhanê nêzîkî 300 milyon kes tiryakê bi kar tînin û rêjeya bazirganiya wan jî zêde dibe.

**Li hember van siyasetan têgihiştina jin û ciwanan**

Tesbîtên me di jor de li ser bikaranîna madeyên hişbir û bandora wê li ser tenduristiya mirov, him di aliyê piskeolojîk, exlaqî, civakî û fîzîkî ve, tenê li ser katagoriyekî taybet ji civakê nayê pêkanîn û pêşxistin, hema bêje tevahî civak ketiya xefka van madeyan û bi kar tînin.

Bi taybet em ê balê bikşînin li ser ciwanan û jinên ciwan, ji ber herî zêde ku di civakê de pê bandor dibin û bikartînin ciwan in. Ev yek bi gelemperî di tevahî cîhanê de hatiye pêşxistin. Gelo ev yek bi çi siyasetê tê kirin û belavkirin, divê em di ferqa vê yekê de bin. Ger îro hêzên hegomonîk û moderrnîteya kapîtal ji bo xwe cîhanê li ser tiliyên xwe tevdigerîne û kontrol dike, wê demê belavbûna diyardeyên bi vî awayî di nava civakê de ne tiştekî ji rêzê ye.

Hêzên sermayedar, hêza ciwanan hedefdigre, em ê nebêjin ku tirsa wan ji vê katagoriyê nîne, ji ber di cîhanê de hêza herî herikbar û di xolek û saniyê de dikare xwe biguhere, tiştekî pêşbixe, analîzek û diyalektîkek di serê wî/wê de pêşbikeve, ew jî ciwan in. Ger hêza ciwanan bikeve nava lêkolîn, analîz û fikrandina ku ka li derdor çi tê qewmandin, wê demê ev ê bibe trajediya herî mezin ji sermayeyê re. Ketina ferqa li derdor di aliyê siyaset, pergal, civakî, ekonomî, şer û pevçûnên tên rûdan û hwd. Wê rê nede ku pergala heyî bigihîne vê astê. Weke ku tu rastiya wan raxîna ber çavan û fikirekî demokratîk derxîne holê û pê li hember kapîtalîzmê şer bikî. Çawa ku felsefeya Rêber Abdullah Ocalan di serdema 21’emîn de derxistiye holê.

Belavkirina madeyên hişbir jî bûye hêsantirîn rêbazên hedefgirtina hêza herikbar a jinên ciwan û ciwanan. Çawa ku ji xwe re hêza ciwantiyê metirsî dibînin û di heman demê de jinên ciwan jî wiha digrin dest. Li ser jin hê siyasetên xirabtir didin meşandin. Li hember van rêbazan divê yekemîn tişta ku bê kirin, jinên ciwan û ciwan bikevin ferqa siyaseta pergala serwer û bikaranîna wan ji hêza ciwantiyê re. Helbet pêkanîna vê bi awayekî ji rêzê ne gengaze. Di destpêkê de divê em xwe nas bikin, perwerde bikin, asoyên xwe yên derveyî pîvanên ku pergalê ji me re danîne avabikin û bilindbikin. Di vê derbarê de yekane kesê ku ev diyardeyên civakî, siyaseta heyî, rêbazê xwegihandina van rastiyan û çareserkirina wê Rêber Apo di bîrdoziya xwe de bi berfirehî aniye ziman.

# Eniya demokratîk li hemberî eniya desthilatdar hêza avaker e

Eniya Demokratîk vebijêrka gelan e, di rewşa heyî ya niha de ew ê temsîla îradeya hemû gelan ku ne tenê gelên Sûriyê bike û ji bo hemû veguherînên demokratîk ên li herêmê jî, dê bibe modelekê, hem jî pêkanîna wê siberoja Sûriyê ji berjewendiyên navdewletî û desthilatdarî biparêze.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**



**Rêveberiyeke demokratîk li şûna aloziyên mezhebî**

Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an, bi beşdariya Kurd û pêkhateyên din weke Ereb, Suryan, Asûr, li bajarê Kobanê dest pê kir. Armanc ew bû ku rêveberiyek demokratîk li şûna aloziyên mezhebî yên ji ber aloziya Sûriyê ya di 15'ê Adara 2011'an de derketiye û digel destwerdanên derve de veguheriye êrişên leşkerî, were avakirin. Di 18'ê Îlona 2013'an de Meclisa Gel a Rojava û Encûmena Niştîmanî ya Kurdî, ji bo destpêkirina projeya "Rêveberina pêvajoyê", peymanek ji 9 bendan îmze kir. Bi pêkhateyên din ji Ereb, Suryan-Asûr, Tirkmen, Çeçen û Ermen re hevdîtinên ji bo lihevkirina ser teşeyê projeyê hatin kirin. Di 12'ê Mijdara 2013'an de, weke saziyekê amadekarî ku piştre Rêveberiyên Xweser werin avakirin, Meclisa Giştî ya Damezrîner a Rêveberiya Demkî ya Hevbeş hat ragihandin, lê beriya rojekê ji ragihandinê Encûmena Niştîmanî ya Kurdî ji vê ragihandinê vekişiya, lê vê yekê bandor li biryara gelên herêmê nekir. Lewra di 21'ê Çileya 2014'an de bi awayekî fermî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li kantona Cizîrê hat ragihandin, piştre Efrîn û Kobanê jî di heman mehê de hatin ragihandin.

Dema bajarê Reqayê di Cotmeha 2017'an de ji çeteyên DAIŞ'ê hat rizgarkirin, hejmara Rêveberiya Xweser û sivîl bûn 7; Cizîr, Efrîn, Firat, Minbic, Reqa, Tebqa û Dêrazor. Di 16'ê Tîrmeha 2018'an de Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) di kongreya xwe ya 3'yemîn de biryar da ku pêwîstî bi avakirina yek rêveberiyê heye. Di 6'ê Îlona 2018'an de komîteyek amadekar ku ji 70 endamî pêk hat, hat avakirin. Bi rêya wê, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi sazûmaniya xwe ya rêxistinî; ku ji Meclisa Giştî, Meclisa Rêveber û Meclisa Edaletê pêk hat, hat avakirin.

**Netew-dewlet ne li gorî xwezayên civakên Rojhilata Navîn e**

Rêveberiya Xweser xwe dispêre felsefeya neteweya demokratîk a Rêber Apo ku di gelek parêznameyên xwe de bi taybet di parêznameya Sosyolojiya Azadiyê de behsa wê yekê dike. Dema parêzerên Rêber Apo pê re hevdîtin kirin û behsa têgeha Rêveberiya Xweseriya Demokratîk kir, ev yek ne tenê di çarçoveya modeleke Kurdî de girt dest, lê weke modela herî serkeftî ji bo çareserkirina tevahî pirsgirêkên Rojhilata Navîn nîşan da. Rêber Apo diyar kir ku modela netewe-dewletê ne li gorî xwezaya pêkhatina civakên li Rojhilata Navîn e. Rêber Apo dibêje ku Rêveberiya Xweser ne li ser bingeha pransîba yek netewe, yek erdnîgarî û yek ol hatiye avakirin, lê li ser bingehên gelan, civakên cihêreng û li ser bingehên demokrasiyê hatiye avakirin. Ev yek zihniyeta netewe-dewletê derbas dike.

Rêber Apo dibêje: "Di pergala Rêveberiya Xweseriya Demokratîk de, ya girîng vîna rêvebirina civakê ye. Civak erkên dewleta navnedî hêsan dike û xwe bi xwe bi rê ve dibe. Ez li vir dibêjim ku navend erkên xwe radestî civakê dike. Di Rêveberiya Xweseriya Demokratîk tu dijberiya dewletê nîn e." Ji ber vê yekê, Rêveberiya Xweser rêbazek rêveberiyê li derveyî çarçoveya dewletê ye. Di wê rêveberiyê de civak kar û barên xwe li derveyî dewletê bi rê ve dibe. Ew di naverok û felsefeya rêveberiyê de ji rêbazê dewletê cuda ye. Rêveberiya Xweser xwe bi hikumeta navendî ve girê nade, heta di aliyê bersivdana pêdiviyên civakê û xwerêxistinkirina di gund, tax, bajar û herêman de, hewil dide navendîbûna dewletê, tegeh û zihniyeta nijadperestiyê ya dewletê lawaz bike. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk di hundirê civakê de ye û hemû civakê hembêz dike, bingehên wê vîn, daxwaz û pêdiviyên civakê ne.

**Rêveberiya Xweser xwe dispêre rêzgirtina pirrengî û jiyana hevbeş**

Rêveberiya Xweser ji destpêka damezrandina xwe ve, hewil dide modeleke rêveberî ya nû ya xwe dispêre rêzgirtina pirrengî û jiyana hevbeş di nava pêkhateyên netewe, ol û civakî de, ava bike. Ji bo pêkanîna vê yekê, rêveberiyê xwe spart komek ji rêgezên ku nûnertiya adilane di her beşek civakê de, dike. Herwiha divê ev yek dûrî siyasetên dûrxistin û paşguhkirinê bin. Yek ji van rêgezan têgeha neteweya demokratîk e. Ew jî bingeha fikrî û siyasî ya ku Rêveberiya Xweser jê dest pê kiriye. Li gorî vê têgehê, her pêkhateyek çi Kurd, Ereb, Suryan-Asûr, Ermen, Tirkmen û hwd... xwedî maf in ku beşdarî rêvebirina kar û barên herêmê bibin. Divê nasnameya yek netewe û yek ol li ser pêkhateyan neyê ferzkirin.

Ji bo pêkanîna vê rêgezê bi awayekî pratîk, Rêveberiya Xweser di tevahî saziyên xwe de sîstema hevserokatiyê pejirand. Mêr û jin ji pêkhateyên cuda di rêveberiya meclis û rêveberiyan de hene. Ev ne tenê hevsengiyekê di navbera her du zayendan de pêk tîne, lê temsîlkirina wekhev a neteweyan misoger dike. Rêveberiyê di meclis û desteyan de rêbaza beşdarî û temsîlkirina her pêkhateyekê bi kar anîn. Di van saziyan de nûnerên ji tevahî pêkhateyan li gorî rêjeya niştecihbûnê û hebûna wan a erdnîgarî hene. Endamên van saziyan an bi rêya hilbijartinan an jî bi rêya lihevkirinên di navbera meclisên gel tên vebijartin, ji bo ku were misogerkirin ku her pêkhateyek temsîla xwe hebe, bi taybet ev tiştê ku berê hatibû paşguhkirin.

**Ruhê hevgirtin û hevkariya pêkhateyan parastina herêmê xurt kir**

Rêveberiyê girîngiyek mezin da ziman û çandê. Zimanê Kurdî, Erebî û Suryanî wekî zimanên fermî nas kir û ev ziman di dibistanan de hatiye pejirandin. Dezgehên çapemeniyê bi her zimanekî hatin avakirin, derbirîna çandî û olî ya serbest hat teşwîqkirin. Wê jî hişt nasnameya her pêkhateyekê were parastin û hestên wan were xurtkirin. Ev pergala rêveberî bi rêya komînan û meclisên gel li ser bingeheke gel a berfireh hat avakirin. Ev sazûmanî ji hêla şêniyên li taxa û gundan bi xwe tê birêvebirin. Ew şênî yekser beşdarî dayîna biryaran û çavdêriya performansa rojane ya xizmetguzariyan dibin. Herwiha rêveberiyê saziyên ewlehî û parastinê ava kirin, tevahî pêkhate jî di avakirina Hêzên Ewlekariya Hundirîn û QSD', YPG û YPJ'ê de beşdar bûne. Vê yekê ruhê hevgirtin û hevkariya parastina herêmê li dijî gefan xurt kir.

**Rêveberiya Xweser ewlebûna pêkhateyan e**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê modeleke demokratîk a bêhempa temsîl kiriye, wê derfet daye her kesî ku li gorî Hevpeymana Civakî, bi awayekî çalak beşdarî birêvebirina kar û barên xwe bibin. Rêveberiya Xweser tevahî pêkhate hembêz kirin.

Eniya Demokratîk vebijêrka Gelan e di rewşa heyî ya niha de, paradîgmaya ku temsîla îradeya gelên Sûriyê bike, paradîgmaya Rêber Apo ye. Neteweya demokratîk, xweseriya demokratîk, konfederalîzma demokratîk ji bo gelan çavkaniyên herî mezin ên têkoşînê ne. Ji bo xwe gihandina vê pêvajoyê, lazim e li Sûriyê vebijêrka gelan di nava cepheyekê de were bi rêxistinkirin. Eniya Sûriya demokratîk, ji bo ku gelên herêmê, Sûriyeke pirrengî, federal û demokratîk înşaa bikin amûrek e. Ev cephe dê ne tenê daxwazên gelan îfade bike, temsîl bike û bi vê ve sînordar bimîne; di heman demê de li beramberê hêzên navneteweyî alternatîfeke xurt pêk bîne. Di encamê de, eniya demokratîk ne tenê ji bo azadbûna gelên Sûriyê, ji bo gelan û ji bo hemû veguherînên demokratîk ên li herêmê jî, dê bibe modelekê. Ev cephe, siberoja Sûriyê ji berjewendiyên navdewletî û desthilatdarî biparêze.

**Rola jinê di enya demokratîk de parastî ye**

Wekî ku eniya demokratîk parastina pirengiya pêkhate û civakan dike, eyîn demê parastina rol û mafê jinan jî dike. Şoreşa Rojava ya ku xwe dispêre gelan û bi destê jinê ye, rol jinê parast, mînaka wê avakirina hêzeke jin bi navê YPJ'ê ku ji cîhanê re bû hêvî, herwiha cihgirtina jin di nava hemû qadan de biryara guhertina zihniyeta desthilatdariyê bû. Bi vê yekê em dikarin bêjin ku eniya demokratîk bi hemû aliyên xwe temamkere û li dijî eniya desthilatdar hêza avakere.

Ji ber ku niha Sûriyê piştî hilweşandina rêjîma Baas aloziyeke din a şerê mezhebî jiyan dike ku hikumeta veguhêz eyînî rêjîma Baasê rengê pêkhateyên Sûriyê nahilbijêre û dewamiya desthilatdarî û navendîbûnê dike, ev yek jî rê li ber komkujî, kuştin û talanên mezin vekiriye. Hikumeta veguhêz heger rengê nijadperestiyê neguherîne, dîsa paşguhkirinê bikar bîne, wê dîsa pêkhate bê maf bîmin û Sûriya ku ew dixwazin tê de azad, wekhevî û demokrasî hebe, nayê avakirin. Lewma bendê bingehîn ê ku Sûriyê ji vê aloziyê derxîne ku eniya demoratîk tê de bê avakirin. Ji ber bi vê siyaseta niha tu pêkhate hetanî mezheba Sunî jî sûdê nagirin, berovajî wê zêdebûna kiryarên dijmirovî lê pêş dikevin. Divê hikumeta veguhêz jî ji rêya ku niha li Sûriyê dide meşandin veger, ji ber ev rê temên wê kurt dike. Lê heger ew jî xwe di çarçoveya eniya demoratîk de bide avakirin, wê guhertinên mezin ên ber bi Sûriya nû ya tê xwestin, bên kirin. Ji ber Sûriya îro ji her demê zêdetir hewcedarî demokratîkbûnê ye, êdî dema desthilatdariyê divê bê qedandin û tecrûbeyên bi salan ên hatine jiyankirin ku pêkhate dihatin tunkirin, neyên dûbarekirin. Bi şerê nijadî Sûriyê nayê avakirin, lê dema hevqebûlkirinê ye.

## 15'ê Tebaxa 2025'an



**Ahmet Aktaş**

Diyare herkes meraq dike, ka gelo piştî vê qonaxa nû a Tevgera Azadiya Kurdistanê, wê Pêngava15'ê Tebaxê, çawa were pêşewazîkirin? Hilbet di dîroka Tevgera Azadiyê de wate û rola Pêngava 15'ê Tebaxê gelek giring e û xwedî cewherekî bingehîn e.
Lewma divê him qonaxa ku ev pêngav hat avêtin û him ruh û naveroka wê baş were şîrovekirin, da ku di dema pêş de, bi layiqî were bîranîn û di xebata avakirina aştî û civaka demokratik de baş rola xwe bilîze.
Heke em bala xwe baş bidin siyaseta dewleta dagirker û rewşa xerab a Kurdistanê ya serdema wê wextê, em ê hewcedariya pêngavek wisa, zelaltir bibînin.
Dewleta dagirker a Tirk, bi siyaseta nenaskirina gelê Kurd tinê ranewestiya, belê li pey hev, bi kiryarên qirkirina nijadkujî her dewam kir. Tevgera Azadiya ku Rêber Apo pêşengî jê re kir, ji vê siyaseta dijî mirovayê ya qirker re got "NA" û serî hilda.
Dewleta Tirk, li dijî vê Tevgera Azadiyê ku êdî fermî bi navê PKK'ê dest bi karê siyasî kiribû derbeya faşist a leşkeriya 12 Îlonê çêkir û bi taybetî zindana Amedê, weke navenda siyaseta xwe ya êrîşên tunekirinê û qirkirinê xebitand.
Pêşengên Tevgera Azadiyê, li dijî vê hovîtiya dewleta tirk, qehremaniya dîrokî dan meşandin û vî ruhê xweragir, weke wan jî got, "wan dîwarên zindanê qelişand û xwe gihand Rêber û endamên Tevgerê yên derve.
Li ser banga van şêrên zindanê, ji xwe dewleta tirk jî ti rêyên xebata fermî, sivîl û siyasî nehişti bû, êdî Tevgêrê Azadiyê, ji naçarî li pey perwerdê û hemû amadekariyên stratejiya şerê çekdarî, ji Rojhilata Navîn şervanên azadiyê derbasî welat kir û Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an avêtin!
Bi vê kurtedîrokê jî, diyare Tevgera Azadiyê, ji bo hebûna xwe bi stratejiya çekdarî bide pejirandin û him ji dagirkeran re û him bi raya giştî cîhanê bêje; "va ye em hene û hûn naçarin me nas bikin"!
Dibe ku ya herî giring û hêja jî, bi vê pêngavê re, gelê Kurdistanê 'ji xewa mirinê ya li bin çiyayê Agiriyê rabû, zindî bû û niha bûye xwedî îradeya ku êdî karibe, ji koletiyê derbasî qonaxa jiyana azad bibe!
Ji xwe Rêber Apo jî di 27 Sibata 2025'an de, bi daxwuyaniya xwe ya bi navê "Banga Aştî û Cıvaka Demokratîk" ev rastiya raxist ber çavan.
Lê belê ev nayê wateya ku hema ew ê çek were danîn û herkesê dest bi xebata siyaseta demokratîk a bêçek bike.
Ne xêr, her çendîn rewşa Tevgera Azadiyê(ya bi pêşangiya PKK), gihiştiye vê asta serwextiyê, divê aliyên dijber jî werîn vê astê û gavên erênî bavêjin.
Pêngava 15'ê Tebaxê jî, wê di vê çarçovê de, her sal dîsa bi serbilîndî were pêşewazî kirin.
Pêngava 15'ê Tebaxê, stûnek stratejîk a dewletê şikand, serdemek nû a demokratîk afirand.
Her wiha, xebat û karê bi stratejiya nû a siyaseta demokratîk jî, ne bi stratejiya şer û çekdarî, belê bi stratejiya siyaseta demokratî, ne bi zihniyeta kapitalîst, belê bi zihniyeta Komînalî, wê li ser cewherê vê gava pîroz were birêvebirin û bêgûman wê her serkeftî be jî!



# 'Konferans nameya aştî û hevgirtinê ye'

Pêkhateya Ereb, Suryan û civaka Êzdî diyar kirin ku Konferansa Pêkhateyan nameya aştî û hevgirtinê ye û gotin, "Em piştgirên diyalogê ne, pêwîste hevpeyvîneke civakî ku mafê hemû gel û pêkhateyên Sûriyê biparêze, were sazkirin."



Ednan Kalo



Uyeid Eldeham



Morîs Emsîh



Senherîb Bersûm

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Konferansa Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 8'ê Tebaxê de druşmeya "Bi hev re ji bo pirrengiryeke ku yekîtiya me xurt dike" li Navenda Çand û Hunerê ya li Taxa Xwêran ya bajarê Hesekê li dar ket. Di konferansê de nêzî 500 siyasetmeda ji hemû pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdar bûn, ji Kurd, Ereb, Suryanî, ermenî, Tirkman û Çerkez herwiha QSD, Tevgera Civaka Demokratîk, rêxistinên jinan, partiyên siyasî û hwd… amade bûn. Derbarê Konferansa Pêkhateyan, endamê Kordînasiyona Yekîtiya Êzdiyên Sûriyê li Cîhanê Ednan Kalo, Uyeid Eldeham ku yek ji rûspiyên eşîreya Şerabiyan e ,Metranê Ebreşiya Cezîr û Firatê yê Dêra Suryanî ya Ersezoks, Mar Morîs Emsîh û hevserokê Partiya Yekîtiya Suryanî Senherîb Bersûm ji rojnameya me reaxivîn.

**'Konferans şensekî mezin e ji bo civaka Êzdî'**

Endamê Kordînasiyona Yekîtiya Êzdiyên Sûriyê li Cîhanê Ednan Kalo destnîşan kir ku Konferansa Pêkhateyan şensekî dîrokî ye ji bo Êzdiyan û wisa bi lêv kir: " Di dîroka Rojhilata Navîn û cîhanê de kombûnek û konferanseke wiha çênebûye, kirîza ku li Sûriyê jî çêbû ji bo pêkanîna şerê navxweyî di nav pêkhateyan de. Di dema heyî de jî hemû hewldan tên kirin ku şerekî di nav pêkhateyan de çêbikin, lê ev konferans bersiveke mezin bû ji bo alîgirên fitneyê. Aliyê şensdar ji sîstema Netweya Demkratîk û Rêveberiya Xweser û vê konferansê civaka Êzdî bû. Civaka Êzdî beriya şoreşê nikarîbû rengê xwe û dengê xwe, hem jî çand û cejinên xwe derxîne ji derdorê re. Lê bi saya şehîd û şoreşgerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê em bi aramî û dilxweşî bi pêkhateyên din re dijîn. Weke civaka Êzdî em soza piştgitriyê ji bo Rêveberiya Xweser û QSD'ê di vî konferansê nû dikin."

**'Em piştgirên diyalogê ne'**

Uyeid Eldeham ku yek ji rûspiyên eşîreya Şerabiyan e, diyar kir ku pêkhateya Ereb rijandina xwînê naxwaze û piştgirên diyalogê ne û wiha domand: "Di vê konferansê de hemû pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo xurtkirina yekîtiya gelê Sûriyê li hev civiyan. Em jî weke pêkhateya Ereb ji eşreya Şerabiyan Konferansa Yekîtiya Helwesta Pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û di demeke wiha de gaveke dîrokî ye Armanca konferansê ew e ku hevgirtina pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê xurt bibe. Herwiha namekê eşkere bidin hemû aliyên Sûriyê aliyên navneteyî û ku ev pêkhate yek helwest in û ew jî avakirina Sûriyeke pirreng nenavendî dixwazin. hemû gelê Sûriyê tê de di erkên xwe de wekhev bin. Em tekez dikin ku diyalog riya çareseriyê ye, herwiha em destekê didin peymana 10 Adarê a di navbera QSD'ê û hikumeta veguhêz a Şamê. Em dixwazin ku bi riya diyalog û peymanan, mafê tu aliyan winda nebe û rê li pêşiya herikandina xwînê were girtin."

**'Konferans nameya aştiyê ye'**

Metranê Ebreşiya Cezîr û Firatê yê Dêra Suryanî ya Ersezoks, Mar Morîs Emsîh da zanîn ku Konferansa Pêkhateyan nameya Xwdê a aştiyê bû û wiha axivî: "Di serî de em bejina xwe ji bo şehîdan ditewînin, dilovaniya Xwedê li giyanê wan be, ev konferans ji bo hemû pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hem jî tevahiya Sûriyê nameya Xwdê ya ku ji bo pêkanîna aştiyê ye. Em bi hêvî ne ku ev konferans bibe gava destpêkê ber bi xabata hevbeş û serkeftinê."

**'Pêwîst e hevpeyvîneke civakî ji bo Sûryê bê sazkirin'**

Hevserokê Partiya Yekîtiya Suryanî Senherîb Bersûm anî ziman ku gelên Sûriyê hewcedarî hevpeyvîneke civakî ne û got,"Konferansa Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî roleke mezin e ji bo çareserkirina pirsgirêka Sûriyê. Bi navê hemû pêkhateya Suryan li tevahiya Sûriyê em tekez dikin ku ev konferans gaveke bi hêz e ji bo xwegihandina diyalogê û nerîneke hevbeş. Em dibînin ku çareseriya berdewam di riya destûreke demokratîk de ye, di nav de cihêrengiya netewî, çadî û olî ku Sûriyeke nenavendî ava dike û di nava xwe de beşdariya rasteqîn ji hemû pêkhateyan. Di vê çarçoveyê de em dibînin ku rghandina destûrî ne li gorî berjewendiyên gelê Sûriyê ye di azadî û rûmeta mirovî de, pêwstî e hevpeyvîneke civakî ku mafê hemû pêkhateyên Sûriyê biparêze, were sazkirin."

# Bi kurt û cewherî nêrînek li xebata komînan

**Volqan Elî**

Civak, wekî di hemû heyînan de bûye, ji rengîniyên cur bi cur ava dibe. Wekî ku di hemû pêkhatinên hebûnan de bûye, civak jî ji dualîbûna enerjî-made, ruh-beden (laş), mane-avanî çêdibe. Pêkhatin, hem ruh e û hem jî laş e. Di heman demê de hem avanî û hem jî mane ye. Wekî pêkhatin, pêşberê vê yê di civakê de, jiyana bi hev re û komînalbûn e. Ev di roja me ya îro de tê maneya bihevrebûna yên ku hişmendiya hevbeş ya neteweya demokatîk parve dikin. hewce dike ev bi bedenbûn li gorî ruhê neteweya demokatîk jî çêbibe; ev bi bedenbûn, di paradigmaya me de navê pergala rêxistinî, konfederalîzma demokatîk e. jixwe maneya konfederalîzma demokratîk jî, jiyana bi hev re û hevpar a rengîniyên cuda ye.
Di pergala konfederal demokratîk de her kes dikare tevlî wan mekanîzmayên ku fikra xwe tîne ziman, biryaran digire û rasterast tevlîbûna xwe nîşan dide, bibe. Ev, wekî ku Rêbertiya me dest nîşanî wê dike, tê maneya ku tenê yek kes bêyî rêxistin nemîne. Vaye di vê pergala konfederal a demokatîk de avanîbûn yan jî sazîbûna herî biçûk, komîn e. Di rêxistinbûna konfederal demokatîk de saziya esasî ya demokrasiya rasterast, komîn e.
Yekeyên xebatê yên wekî tax, kolan, gund ku civak têde dijîn, bi terza komîn xwe bi rêxistin dikin, di nava pergala civakî de xwe dispêrin jiyana komînal û demokatîk. Armanc ew e ku hemû civak were bi rêxistinkirin, xwe li pêşberê hemû pirsgirêkên civakî berpirsiyar bibîne û bi şiklekî rasterast tevlî çareseriya hemû pirsgirêkên civakî bibe, di pêşxistina demokrasî û çanda demokrasiyê de bi şiklekî rasterast tevlîbûn nîşan bide. Ji bo civaka exlaqî û polîtîk, bi rola stûnên esasî radibin. Maneya jiyana komînal ew e ku civak bi hev re hebûna xwe bidomîne û bi şiklekî hevpar bijî.
Bi rêxistinbûna komînê, ji vê armanc û felsefeyê bi rê dikeve. Dema ku komîn tê bi rêxistinkirin, takesesê/a ku li cihekî dijî hewce dike herî kêm di nava xebata yek komînê de cihê xwe bigire. Li gorî pêdivî û rewşên ku li wî cihî hene, takekes dikare ji yekê zêdetir di nava xebata komînan de cihê xwe bigire.
Komîn, di mijarên siyasî, civakî, aborî, çandî, parastina cewherî û hwd. ên bi jiyana civakî û pirsgirêkên civakî re eleqadar, li ser esasê hêza cewherî û têra xwe bi xwe kirinê xwe bi rêxistin dike. Ev bi rêxistinbûn bi şiklê tax, kolan, gund, yekeyên xebatê, akademî û kooperatîfan dibe.
Erk û berpirsiyariyên komînê yên bi rêveberiyê re eleqadar jî hene. Yek ji erkên wê yên esasî ew e ku cewhera exlaqî û polîtîk a civakê ku ji aliyê moderniteya kapîtalîst ve hatiye xirakirin derxîne holê, di çarçoveya moderniteya demokatîk de di nava komînê de modela rêxistinbûnê ya demokatîk, ekolojîk û azadiya jinê esas digire bi pêş bixe, her ku diçe vê ferasetê di nava civakê de berbelav bike û bîne rewşa serwer. Ji vê perspektîfê bi rê bikeve, bi aqlê hevbeş û bi zanebûna hevbeş pirsgirêkên takekes û saziyên (civak) ku bi komînê ve girêdayî ne, çareser bike.
Armanca komînê ew e ku refaha ekonomîk û teknolojîk bixe xizmeta civakê, hişmendî û exlaqa ku demokrasî û azadiyê esas digire, bi pêş bixe. Hatiye fêmkirin ku pêşketina ku têde azadî û demokrasî tine û tenê bi refaha civakî re girêdaye, zêde ne xwediyê mane ye. Ji ber vê yekê hewce ye komîn tenê bi çareseriya pirsgirêkên ekonomîk û berhemdariya ekonomîk ve bi şiklekî teng nemîne, bi perspektîfeke firehtir bixebite. Divê komîn wekî cihê jiyana hevpar, demokrasiyê û xwe rêvebirinê were dîtin. Komîn rêxistinbûnê herî teng û biçûk in ku îdealên mirovahiyê yên herî mezin têde çêdibin û tên mezinkirin. Li gorî pêkhateya civaka ku komînek têde çêdibe, li gorî derfetên li ber dest, hewce dike di wê komînê de jin, kêmnetewe, ol û mezhebeen cuda temsîla xwe têde bibînin.
Di navbera komînên gund û bajaran de ferqûcudahiyên cidî tine. Ruxmî ku cewher yek e, ji ber ku gund cihekî teng ê bicihbûnê ye, ji aliyê yekbûyiyên komîte û komîteyên demkî yên ji bo xweserê gund hatine çêkirin ve ferqûcudahî hene. Ji ber ku bi piranî hejmara malbatên li gund kêmtir e, hema bêje her kesê li gund dijî wekî ku endamê/a xwezayî yê komînê be tê hesibandin. Eger malbatên li gund kêm bin, hin caran dikare ji yekbûna du yan jî zêdetir gundan jî yek komîn were çêkirin.

## FENER

### Bi Metodên Aboriya Sexte Şiyanên Sûriyê Tên Firotin



**Idrîs Henan**

Piştî 14 salên şer û kirîzê, Sûriyê di nav tevliheviyeke siyasî, aborî û civakî de maye. Desthilatdariya HTŞ'ê bi peymanên aborî yên bi şîrketên nenas re, bi awayekî şaşwazî hewl dide mîrat û çanda xwe ya terorî kamûflaj bike û xwe wek hêzekî meşrû bide nîşandan. Lê gelê Sûriyê bi van kiryaran nayê xapandin. Ev peymanên mîlyaran dolarî, bi têkiliyên DYA, Tirkiyê û Kendavê re, ne tenê kirîza Sûriyê dirêj dikin, her wiha rolên hêzên destwerdanê ên navenda afirandina kirîzê ne, diyar dikin. HTŞ'ê, ku ji aliyê gelek hêzan ve wek teror tê binavkirin, bi peymanên aborî yên bi guman hewl dide xwe ji vê navûdengêiyê paqij bike. Lê ev peyman, bi şîrketên bêkok ên ne diyar re, ne tenê ne rewa ne, her wiha Sûriyê vediguherînên welatekî bê aborî. Ango lingên wê yên dewletbçûnê qut dikin û gelên wê di agirdanka bêserûberiyê de dişewitînin. Bi awayekî stratejîk, HTŞ'ê dixwaze bi vê rengî xwe wek "gerantorê ewlehiyê" nîşan bide, lê di heman demê de vegevizîna wê di nav berjewendiyên hêzên destwerdanê de, taybet DYA, Tirkiyê û welatên Kendavê, xistiye tevliheviyek mezin a dûrî çi pîvanên mirovahiyê hiştiye . Lewre jî her daxwazeke gelan a şirîkatiya birêvebirina demokratîk weke gefekê li dijî xwe dibîne û bi qirkirin û kuştinê bersivê dide.
DYA, bi şahidî û piştgirîkirina van peymanan, ne tenê polîtîkaya xwe ya li dijî Îran û Rûsyayê dimeşîne, her wiha dixwaze li Sûriyê û herêmê bandora xwe biparêze. Ji ber vê jî eşkere piştgirî dide HTŞ'ê. Lê ji ber ku hêzeke hegemon a qezenca zêde ye, çawa li Kendavê, li Sûriyê jî, eger behra xwe di van kirîn û firotinan de nîn bûya, bê guman wê ti peymanên wisa jî nîn bûna. Di bingeh de; parçekirin û parvekirina aboriya Sûriyê ye. HTŞ'ê jî têgihaştiye ku di çarenûsa Sûriyê de, ti rola wê nîne, lew re Sûriyê dikire û difroşe.
Tirkiye jî, bi piştgirîkirina HTŞ'ê re hewl dide ku li dijî pêşengiya Kurdan li herêmê bisekine. Siyaseta Tirkiyê ya mêtingeriyê, bi taybetî li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ne tenê kirîzê dirêj dike, her wiha metirsiyeke mezin li ser pêşveçûna demokratîk a herêmê ye. Derdê wê jî tunekirina doza Kurd, firehkirina dagirkeriya xwe û zindîkirina xeyalên Osmancîtiya nû ye. QSD ku di bin sîwana wê de tevahiya pêkhateyên Sûriyê hene, wek alternatîfa herî guncaw tê dîtin. Ev model, bi pîvanên demokrasî, wekhevî û edaletê, bûye aktorê çareseriyeke rastîn. QSD ji bo pêkhateyên ku rastî komkujî û qirkirinê tên, bûye hêviya rizgariyê. Ancax tenê siyaseteke demokratîk, ku mafên hemû pêkhateyên Sûriyê biparêze, dikare vê kaosê bi dawî bike. Siyasetên berjewendîperest ên navendên hegemoniyê, Tirkiyê û hêzên din, tenê kirîzê dirêj dikin. QSD bi modela xwe ya Sûryeya nenavendî û demokratîk, dikare bibe hêza çareseriya guncaw.
Kirîza Sûriyê ne tenê pirsgirêkeke navxweyî ye, lê belê di nav têkîliyên global de bûye kirîzeke navdewletî ku çi dozên wê yên hundirîn hebin, ancax bi gerantiyeke navneteweyî werin çareserkirin. Lê dîsa jî, çende mudexele hebe û bi hêz be, eger mekanîzmaya çareseriyê ne demokratîk û li ser bingeha hevdu qebûlkirinê be, alozî xilas nabe. Kengê desthilatdariyên li Qesra Şamê bi cih dibin, bigihêjin baweriya ku pirrengî, demokrasî û wekhevî ne gefeke li dijî wan e, wê çaxê fikrên çaresriya ku dûrî berjewendiya hêzên derve ye dê di cokên rast ên niştimanperweriyê de biherikin. Ne ev hişmendî be, dê hişmendiya xapandin û firotina şiyan û destkeftiyên gelên welat be.